**Li Tirkîyeyê di du hefteyên dawîn de…**

1-15 Cotmeh, 2023

**2ê Cotmehê, 2023**

**Rêveberiya ODTUyê heta sala 2090î ketina kampusê li serokê Komeleya Destûrdaran qedexe kir**

**Ketina kampusa ODTUyê li Serokê Lijneya Rêvebiriya Komeleya Destûrdarên ODTUyê Baki Arslan heta sala 2090an hat qedexekirin.**




Komeleya Destûrdaran li ser hesabê xwe yê Twîtterê qedexe eşkere kir û ragihand ku bi hinceta ku “heta sala 2090î qedexekirî ye” nehiştine Serokê Lijneya Rêvebiriyê têkeve kampusê. Sedema qedexeyê nehatiye eşkerekirin û daxwazên wan ên nivîskî ji bo agahiyan bêbersiv mane.

Komeleyê bi bîr xist ku di demên cuda de ketina kampusê li endamên cuda yên lijneyê hatiye qedexekirin û diyar kir ku ew ê dest bi pêvajoya hiqûqî bikin.

*ODTÜ Mezunlar Derneği (Twitter) - https://x.com/odtu_md/status/1708726054653686195?s=20*

*Anka Ajansı - https://twitter.com/ankahabera/status/1709543418467143959*

*Gazete Duvar - https://www.gazeteduvar.com.tr/odtu-mezunlar-dernegi-baskaninin-kampuse-girisi-2090a-kadar-yasaklandi-haber-1640436*

**4ê Cotmehê, 2023**

**Lijneya Bilind a Radyo û Televîzyonê 5 bernameyên Halk TVyê rawestandin û cezayê pereyê lê birî**



Lijneya Bilind a Radyo û Televîzyonê (RTUK) di civîna xwe ya heftane ya asayî de biryar da ku du raporên cuda yên çavdêriyê yên derbarê Halk TV de bixe rojeva xwe.

Rapora ewil a li ser maseyê ya rojnameger Ayşenur Arslan bû ku duh hat binçavkirin û piştî îfadeyê hat berdan. Ayşenur Arslan di bernameya xwe ya Halk TV de der barê êrîşa bombeyî ya li Enqereyê ya li ber Wezareta Karên Hundirîn de got, "Dibe ku ew kes nizane bombe li ser wî heye. Nabe ku yek were tiştekî neke û bimire. Hûn ji min bipirsin, ev yek tiştekî seyr e.  ji nişka ve xwe teqand. Çima li şûna ku li Enqereyê otomobîlekê veke û bixebitîne, li Kayseriyê yek kuştiye û gotiye; Heeyy! Em tên. Bombe li ser pişta me, çek di destên me de ne. Ev çi ye?” RTUKê ev gotin "li dijî prensîbên weşanê" nirxandin.

RTUKê bi hinceta ku hukmê Qanûna bi hejmara 6112an a ku dibêje “Xizmetên weşanê…. Nabe ku çalakiya terorî, sûcdar û mexdûrên wê bi awayekî ku encamên wê xizmeta terorê bike biweşîne” cezayê pereyî ya ji pîleya bilindtirîn lê birî. Her wiha biryar da ku bername 5 caran bê rawestandin.

RTÛKê li ser rapora pisporî ya der barê bernameya "Maseya Nûçeyan" a Halk TVyê de jî biryar da. Derhêner û lîstikvan Ezel Akay ku wek mêvan beşdarî bernameyê bû, der barê 60emîn Mihrîcana Fîlman a Porteqala Zêrîn de axivî. Wekî tê zanîn Wezareta Çand û Tûrîzmê ji ber ku fîlmê "Hikmê Qanûnê" di nav berhemên ku dê di kategoriya belgefîlman a festîvalê de bikevin pêşbirkê de cih girtibû piştevaniya xwe vekişandibû. Akay der heq vê rewşê de şîroveyên xwe anîn zimên. Şîroveyên wê ji aliyê RTUKê ve wekî 'binpêkirina qanûnê' hatin nirxandin. Lijneyê, nirxandinên Akay wekî "daxuyaniyên bêbingeh ku Dewleta Komara Tirkiyeyê sûcdar dikin" bi nav kirin û bi hinceta "prensîbên weşanê yên di qanûnê de hatine diyarkirin binpê kiriye" ji sedî 3 cezayê pereyî yê îdarî li Halk TVyê birî.

*Gazete Duvar - https://www.gazeteduvar.com.tr/rtukten-halk-tvye-5-kez-program-durdurma-ve-para-cezasi-haber-1640813*

*Anadolu Ajansı – https://www.aa.com.tr/tr/gundem/rtukten-halk-tvye-5-kez-program-durdurma-ve-ust-sinirdan-idari-para-cezasi*

**5ê Cotmehê, 2023**

**Xebatkarên ewlehiyê yên taybet xwendekarên zanîngehê binçav kirin ku zêdebûna heqê xwarinê protesto dikirin**

Çalakiya xwendekarên Zanîngehên Ege û Dokuz Eylûlê (DEU) ya li dijî zêdekirina ji sedî 200 bihayên aşxaneyên zanîngehan di roja xwe ya sêyemîn de didome.

Şêwirmendê Rektorê DEUyê ku îro ji bo bi xwendekaran re hevdîtinê pêk bîne û daxwazên wan guhdarî bike randevû dabû wan, nehat randevûya xwe. Xwendekar çûn aşxaneyê û çalakiya xwe berdewam kirin. Xebatkarên ewlehiyê yên taybet 8 ji xwendekarên xwepêşander tevî ku rayeya wan tune ye, binçav kirin û li derveyî kampusa zanîngehê radestî polîs kirin. Xwendekarên hatin binçavkirin Rozana Urkun, Sena Zabite Tekîn, Selen Dendeş, Emîr Ata Can, Zafer Aydin, Hejar Al û Eylûl Lara Sarper birin Şaxa Emniyetê.

*Evrensel - https://www.evrensel.net/haber/500461/yemekhane-zamlarini-protesto-eden-ogrenciler-gozaltina-alindi*

*Mezopotamya Haber Ajansı - http://mezopotamyaajansi35.com/tum-haberler/content/view/220445*

*Cumhuriyet - https://www.cumhuriyet.com.tr/turkiye/yemek-zamlarini-protesto-eden-ogrencilere-mudahale-8-gozalti-2126810*

**Karkerên demsalî yên Sûriyeyî di konê ku tê de diman bi gaza karbonmonoksîtê jehrî bûn**

Li navçeya Gelendost a Ispartayê, karkerên demsalî yên Sûriyeyî ji ber gaza karbonmonoksîtê ku ji dara ku di tenekeyê de şewitandin derket jehrî bûn. Ji malbatekê 6 kes, di nav wan de 4 zarok, rakirin nexweşxaneyê.

*Burdur Gazetesi - https://www.burdurgazetesi.com/haber/16841664/ispartada-tarim-iscileri-olumden-dondu-cok-sayida-isci-hastanede*

*BirGün - https://www.birgun.net/haber/isparta-da-gazdan-etkilenen-4-u-cocuk-6-isci-hastaneye-kaldirildi-473660*

*SonSes Tv - https://www.sonses.tv/ispartada-4u-cocuk-6-tarim-iscisi-karbonmonoksit-gazindan-zehirlendi*

**Zanîngeha Munzurê profesorê ku daxuyaniya Ocalan parve kiribû ji peywirê bi dûr xist.**

Endamê Hîndekariyê yê Beşa Civaknasiyê ya Fakulteya Edebiyatê ya Zanîngeha Munzurê Prof. Dr. Alî Kemal Ozcan ji ber îxbara ku der barê wî de bi îdiaya "pesnê serokê rêxistina terorê daye" ji bo îfadeyê bo Midûriyeta Emniyetê ya Tûnceliyê hat vewxendin. Ozcan ji peywira xwe ya li zanîngehê hat bidûrxistin; Der barê wî de kirariyên edlî û îdarî hatin destpêkirin. Ozcan ê ku pirtûkên wî yên li ser Ocalan hatine nivîsandin hene, di hilbijartinên herêmî yên sala 2019an de ku tenê li Stenbolê hatin dubarekirin, di kanalên weşanê yên nêzî hikûmetê de "daxuyaniya ji bo raya giştî ya Ocalan" parve kiribû û ketibû rojevê.

*Rûdaw - https://www.rudaw.net/turkish/middleeast/turkey/0510202313*

*Tele 1 - https://tele1.com.tr/ocalanin-aciklamasini-paylasan-akademisyen-ali-kemal-ozcan-gorevden-alindi-926290/*

*DW Türkçe - https://www.dw.com/tr/%C3%B6calan%C4%B1n-mektubunu-okuyan-profes%C3%B6re-soru%C5%9Fturma/video-67023496*

**6ê Cotmehê, 2023**

**Walîtiya Şirnexê ji bo 9 rojan civîn û çalakiyên li qada giştî li tevahiya bajêr qedexe kirin.**

Çalakiyên ku Walîtiyê li tevahiya parêzgehê tevî navenda bajêr û navçeyan ji 6ê Cotmehê heta nîvê şeva 15ê Cotmehê qedexe kirine ev in: her cure civînên vekirî û meşên xwepêşandanê, merasîmên pêşwazîkirin û xatirxwestinê yên girseyî, daxuyaniyên çapemeniyê yên sazî û rêxistinên li derveyî avahiyên xwe pêk tînin, çalakiyên rûniştinê, mîtîng, sazkirina konan, kampanyayên îmzeyan, vekirina standan, merasîmên cenazeyan ên girseyî û serdanên goristanan, merasîma bîranînê, festîval, konser, şahî, şano, pêşandan, her cure çalakiyên dengî û dîtbarî, firandina bafirok, fanosên mirazî, drone-paramotoran, çalakiyên hewavaniyê, ji bilî çalakiyên bazirganî yên kes û saziyên bi nasnameya bazirganî; belavkirina belavok û broşuran, daliqandina afîş û pankartan.

Bernameyên ku ji aliyê sazî û dezgehên giştî ve tên lidarxistin, cejnên fermî, rojên bibîranînê yên fermî, merasîm û şahiyên fermî û bernameyên ku ji aliyê van saziyan ve li gorî kevneşopî û adetan tên li darxistin li derveyî qedexeyan hatin hiştin. Walîtiyê di navbera 16ê Îlonê û 25ê Îlonê de bi heman çarçowe û peywendê, 10 rojan qedexe pek anîbûn.

*Şırnak Valiliği - http://www.sirnak.gov.tr/yasaklama-karari-06102023 | http://www.sirnak.gov.tr/yasaklama-karari-16092023*

*Cumhuriyet - https://www.cumhuriyet.com.tr/turkiye/sirnak-valiligi-duyurdu-10-gunluk-eylem-yasagi-karari-alindi-2127222*

*Yeni Şafak - https://www.yenisafak.com/gundem/vanda-gosteri-yuruyusu-ve-acik-hava-toplantilarina-dort-gun-yasak-4565511*

*12 Punto - https://12punto.com.tr/gundem/valilik-duyurdu-sirnakta-10-gunluk-eylem-yasagi-667*

**7ê Cotmehê, 2023**

**Walîtiya Enqereyê destûr neda 13emîn Meşa Jinan a Cîhanê û konserê**

Destûr nehat dayîn bo meş û konsera ku wê di 8ê Cotmehê roja Yekşemê de di çarçoveya 13emîn civînên tevgera femînîst a navneteweyî ya Meşa Jinan a Cîhanê (WMW) de li Enqereyê bihata lidarxistin. Ji 63 welatan 130 jin dê beşdar bibûna.

Civîna navneteweyî ji aliyê Meşa Jinan a Cîhanê ve ku di sala 1998an de bi jinên ji 63 welatên ji 5 parzemînên cîhanê dest pê kir, du salan carekê tê organîzekirin.  Di sala 2022an de Yıldız Temurturkan wekî Koordînatora Navneteweyî hat hilbijartin dora civînê derbasî Tirkiyeyê bû.

Ji bo ku ev çalakî li qadên vekirî bên lidarxistin serî li walîtiyê hat dayîn. Di bersiva fermî ya Walîtiyê de hat diyarkirin ku li qadên vekirî çalakiyên têkildar guncav nayên dîtin û ger ji bo li qadên girtî bên birêxistinkirin serlêdan bê kirin dê rewş ji nû ve bê nirxandin.

*Karar - https://www.karar.com/sehir-haberleri/ankara-valiliginden-dunya-kadin-yuruyusu-yasagi-1793990*

*Yeşil Gazete - https://yesilgazete.org/ankarada-yapilmasi-planlanan-dunya-kadin-yuruyusu-valilik-karariyla-yasaklandi*

*Susma 24 - https://susma24.com/ankara-valiligi-dunya-kadin-yuruyusu-ve-konserlerini-yasakladi*

**9ê Cotmehê, 2023**

**Qeymeqamtiya Kagithaneyê daxuyaniyên li ser doza Komeleya Tarlabaşı û hemû çalakiyên têkildar bo rojekê qedexe kirin**

Hat xwestin ku li ber edliyeyê, der barê rûniştina doza "fesihkirina komeleyê" ku li 18emîn Dadgeha Cezayê Asliyeyê ya Stenbolê hatiye vekirin de daxuyaniya çapemeniyê bê dayîn lê Qemeqamtiya Kagıthaneyê ev yek qedexekir. Ev doz yek ji du dozên cuda ye ku der barê Komeleya Piştgiriya Civaka Tarlabaşiyê de hatine vekirin .

Qeymeqamtiyê biryara qedexeyê wiha eşkere kir: “Bi bangên têkildarî bûyerê yên li ser hesabê medyaya civakî ya bi navê Navenda Civakê ya Tarlabaşiyê (@TarlabasiTM) û li ser platformên cuda yên medyaya civakî ve girêdayî, “çalakiya rûniştinê, daxuyaniya çapemeniyê, kombûn, civîn, sazkirina standan" ji 10.09.2023yan pê ve li hemû qadên vekirî yên li derdora Qesra Edaletê ya Stenbolê û li seranserê Taxa Kagithaneyê her cure çalakî ji bo rojekê hatiye qedexekirin."

Taxa Tarlabaşiyê li navenda dîrokî/bajarî ya Stenbolê ye û di salên 90î de gelek koçber hatinê û gelek kesên xizan ên ji çand û etnîsiteyên cûda lê dijîn. Navenda Civaka Tarlabaşiyê ev 17 sal in piştevaniya civaka vê taxê dike û ji bo zarok û jinan hewl dide ku qadên ewle ava bike.

Di Hezîrana 2021î de Navendê li ser rênîşa “Divê xwendekarên LGBTI+ çawa li hember çewisandina malbat û dibistanê bên parastin?” çalakiyek li dar xist. Li dû wê, kampanyaya reşkirinê li ser medyaya civakê dest pê kir û venerînên îdarî pêk hat. Dûre du dozên bo girtina komeleyê vebûne bi awayekî dij-qaydeyî berdewam dikin.

*Kağıthane Kaymakamlığı - http://www.kagithane.gov.tr/yasaklanma-karari*

*Gazete Duvar - https://www.gazeteduvar.com.tr/tarlabasi-toplum-merkezi-davasi-8-ocaka-ertelendi-kaymakamliktan-bir-gunluk-aciklama-yasagi-haber-1641423*

**10ê Cotmehê, 2023**

**Der barê jinên ku li Wanê tacîza çawîşên pispor protesto kirin de lêpirsîn hat destpêkirin**

Der barê rêveberên Komeleya Jinan a STARê de ku li Wanê taciza çawîşên pispor a li jinan protesto kirin, lêpirsîn hat vekirin. 8 jin ji ber pankarta di daxuyaniya çapemeniyê de hat vekirin bi mebesta "defdana gel a kîn û dijminatiyê" tên sûcdarkirin. Li ser pankartê wisa hatibû nivîsandin: "Têkoşîna rêxistinbûyî ya jinan a li dijî tacîz û tecawiza kesên bi unîforma dê bi ser keve".

Ji rêveberên Komeleya Jinan a STARê Sevgî Ozdînç, Serap Guvenç, Rojbîn Bor, yek ji parêzerên komeleyê Zeynep Demîr, Hevseroka Giştî ya Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) ya Wanê Handan Karakoyun û aktîvîsta TJAyê Aynur Tarhan jî di nav de 8 jin çûn Midûriyeta Emniyetê ya Bajêr û îfade dan.

*Mezopotamya Haber Ajansı - http://mezopotamyaajansi35.com/KADIN/content/view/221022*

*Jin News - https://jinpanel.com/GUNCEL/content/view/219153*

**11ê Cotmehê, 2023**

**Li Konsera Koroya Gel û Koma Bajar mudaxeleya ewlehiya taybet**

Li gorî daxuyaniya Komeleya Pira Gel ku li ser hesabê xwe yê fermî yê medyaya civakî weşand, di çalakiya bidawîkirinê ya Mîhrîcana Fîlman a Penaberan de ku îsal cara sêyemîn e ji aliyê komeleyê ve tê lidarxistin, mudaxeleyî hunermendan hat kirin.

Di çalakiya bidawîkirinê de ku li Navenda Hunerê ya Ahmet Adnan Saygun a Îzmîrê de pêk hat. Koroya Gel û Koma Bajar derketin ser dikê. Lê belê li gorî daxuyaniya komeleyê, dema ku temaşevanan ber bi dawiya konsera Bajar ve govend gerand, rêvebira navendê Emel Akçay Ozer telefonî seroka komeleyê Nuray Pehlîvan kir û xwest konser tavilê bê rawestandin. Li ser fermana Midûra Navendê, bi hinceta ku di dawiya konserê de govend hatiye kişandin, hêzên ewlehiyê yên taybet hunermend bi darê zorê ji navendê derxistin.

*Halkların Köprüsü (Twitter) - https://x.com/halk_koprusu/status/1711423608113836519?s=20*

*Sanat Özgürlüğünü İzleme Platformu - https://www.reportare.com/soz/haber/bajar-konserine-ozel-guvenlik-mudahalesi*

*Siyasi Haber - https://siyasihaber9.org/izmir-belediyesi-festivalde-halayi-yasaklamak-istedi*

**Li Dêrsimê ji bo çar rojan, li Dîlokê ji bo rojekê û li Bîngolê ji bo 3 rojan çalakî hatin qedexekirin.**

Li Dêrsimê walîtiyê ragihand ku li tevahiya bajêr ji bo 4 rojan çalakiyên wekî civîn û xwepêşandanan hatine qedexekirin.

Daxuyaniya nivîskî ya Walîtiyê wiha ye:

"Ji bo temînkirina ewlekariya neteweyî, parastina nîzam û ewlekariya giştî, pêşîgirtina li sûc, parastina maf û azadiyên bingehîn, maf û azadiyên kesên din û nîzama giştî, pêşîgirtina li bûyerên tundiyê û pêşîgirtina li her rewşa neyînî ya ku pêkan e çêbibe (…) çalakiyên wekî daxuyaniyên çapemeniyê, civîn û xwepêşandan, mîtîng, civînên li qada vekirî, protesto, çalakiya rûniştinê, bîranîn, grevên birçîbûnê, vekirina standan, kampanyayên îmzeyan, konser, mîhrîcan, belavkirina belavokan, vekirina pankart û afîşan, pêxistin û hilgirtina meşaleyan,

konferans, nîşandana sînevîzyonê û hwd. ji 12ê Cotmehê saet 00.01î heta 15ê Cotmehê saet 23.59an ji bo 4 rojan girêdayî destûra amirê mulkî û rêveberî ye.

Piştî vê daxuyaniyê, waliyên Dîlok û Bîngolê jî ji ber heman sedeman li bajarên xwe qedexe ragihandin.

Qedexeya li Dîlokê wê ji 12ê Cotmehê saet 08.00an heta 13ê Cotmehê saet 08.00an û li Çewlikê jî ji 12ê Cotmehê saet 00.01î heta 14ê Cotmehê saet 23.59an berdewam bike.

*Tunceli Valiliği - http://www.tunceli.gov.tr/kurumlar/tunceli.gov.tr/Duyurular/2023/Ekim/duyuru.pdf*

*Bingöl Valiliği (Twitter) - https://x.com/bingolvaliligi/status/1712180866896592967?s=20*

*Gaziantep Valiliği (Twitter) - https://x.com/gantepvaliligi/status/1712147993489506810?s=20*

**Di çalakiya karkerên înşaetê yên Lîmak Holdîngê de 6 kes hatin binçavkirin**

Karkerên înşaetê yên li Şantiyeya Bankeya Navendî ya Fînansê ya girêdayî Lîmak Holdîngê dixebitin bi hinceta ku nikarin mafên xwe bigirin çalakî li dar xistin, lê karker ji aliyê polîsan ve hatin binçavkirin.

Peywirdarên ewlehiyê yên taybet ên şantiyeyê êrişî çalakiya karkeran a bi pêşengiya Sendîkaya Karkerên Înşaatê (Inşaat Iş), Sendîkaya Înşaet û Rêyan (Dev Yapı Iş) hat lidarxistin, kirin. Karker ji aliyê polîsên ku piştre hatin qadê hatin binçavkirin.

Di nav kesên hatin binçavkirin de 6 karkerên înşaetê, Sekreterê Giştî yê Dev Yapı Işê Nîhat Demîr û Serokê Giştî yê Sendîkaya Inşaat Işê Yunus Ozgur jî hene.

*Cumhuriyet - https://www.cumhuriyet.com.tr/ekonomi/limak-insaatinda-hak-mucadelesi-gozaltilar-var-2128921*

*Sol Haber - https://haber.sol.org.tr/haber/limak-insaatinda-hak-mucadelesi-6-isci-gozaltina-alindi-385452*

**12ê Cotmehê, 2023**

**Walîtiya Edeneyê bi fikara "bikaranîna alkolê" û ewlehiyê Festîvala Rockê ya Çukurovayê qedexe kir.**

6emîn Festîvala Rockê ya Çukurovayê ku wê di navbera 12-15ê Cotmeha 2023an de li Edeneyê bihata lidarxistin, ji aliyê Walîtiya Edeneyê ve hat betalkirin.

Çend saet beriya destpêkirina mîhrîcanê ku hunermendên wekî Selda Bagcan, Manuş Baba, Ceza, Pentagram, Gazapizm, Uzi, Heijan û Debubluman derketina ser dikê, biryara betalkirinê ya walîtiyê bi nivîskî ji fîrmaya organîzasyonê ya Million Productions re hat ragihandin.

Di nav sedemên qedexekirina Festîvala Rockê ya Çukurovayê de ev hebûn: "Li derdora qada çalakiyê bufeyên ku alkolê difiroşin hene û ev yek wê bibe sedema sûcên wekî destdirêjiya zayendî, birîndarkirin û diziyê ya girêdayî alkolê."

Million Productions diyar kir ku ji muzakereyên bi qeymeqamtiyê re ti encamek bi dest nexistine û serî li hiqûqê dane.

Danê êvarê Dadgeha Îdarî ya Edeneyê biryar da ku pêkanîna biryara Walîtiya Edeneyê ya qedexekirina Festîvala Rockê ya Çukurovayê bê rawestandin. Festîval 12ê Cotmehê danê êvarê deriyên xwe vekirin.

*Diken - https://www.diken.com.tr/wp-content/uploads/2023/10/belge-576x1024.jpg*

*Sanat Özgürlüğünü İzleme Platformu - https://www.reportare.com/soz/cukurova-rock-festivali-yasaklandi-gerekce-alkol-kullanimi-ve-guvenlik/*

*https://www.reportare.com/soz/adana-valiliginin-cukurova-rock-festivalini-yasaklama-kararina-durdurma/*

**Hêzên Zeptî bi zor û binçavkirinên hovane, rê li ber daxuyaniya çapemeniyê ku ji bo êrîşên Tirkiyeyê yên esmanî yên li ser Sûriyeyê bên rawestandin û hewldanên protestoyî girtin.**

Bombebaranên dewleta Tirk ên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li gelek bajaran bi daxuyaniyan hate protestokirin. Polîsan di xwepêşandan û daxuyaniyên çapemeniyê de gelek kes binçav kirin û bi tundiyê pêşî li wan girtin.

Li Amed, Dêrsim, Wan, Mêrdîn, Riha, Edene, Mêrsîn, Êlih, Agirî, Mûş, Qers û Îdirê, Partiya Herêmên Demokratîk (DBP), Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) û Partiya Çep a Kesk xwest ku çalakiyên protestoyî û daxuyaniyên çapemeniyê li dar bixin.

Dema polîsan li Parka Rojavayê ya Amedê destûr neda daxuyaniya çapemeniyê, çalakiya rûniştinê hat lidarxistin. Di wê navberê de polîsan nehişt ku rojnameger wêneyan bigirin.

Li Dêrsimê Hevserokên HDPê yên Dêrsimê Nazlı Çelîk û Ferhat Yildiz, Hevşaredarê Periyê Orhan Çelebî ku qeyûm li şûna wî hat tayînkirin, Serokê EMEPê yê Dêrsîmê Ergun Tekîn, Çagdaş Bagaç, Ender Şîmşek, Alî Bozkurt û Hidir Yildirim hatin binçavkirin. Li Rihayê endamên Meclîsa Ciwanan ên Partiya Çep a Kesk Lîvan Orman, Senem Erîş, Sadullah Bîrcan û Mizgîn Çîftçî jî di nav de 15 kes hatin binçavkirin. Li Wanê polîsan destûr neda kesên ku xwest ji Rêxistina DBPê ya Bajarê Wanê derkevin daxuyaniya çapemeniyê bidin. Di vê navberê de rojnamevanên ku dixwestin ji bo nûçeyan wêneyan bikşînin jî hatin astengkirin. Nûnerê Wanê yê Gazete Duvarê Kadîr Cesûr bi tundiya polîsan re rûbirû ma.

*Artı Gerçek - https://artigercek.com/guncel/rojavaya-saldirilar-bircok-kentte-protesto-edildi-268652h*

*Gazete Duvar - https://www.gazeteduvar.com.tr/vanda-basin-aciklamasina-mudahale-gazete-duvar-temsilcisi-darp-edildi-haber-1642002*

**13ê Cotmehê, 2023**

**Walîtiya Mêrdînê ji bo hemû çalakiyan 7 rojan biryara qedexekirinê da**

Walîtiya Mêrdînê çalakiyên wekî belavkirina belavok, daliqandina afîş, civîn, daxuyaniyên çapemeniyê û xwepêşandan li tevahiya bajêr ji bo 7 rojan qedexe kirin. Hat ragihandin ku qedexe wê ji îro pê ve heta 19ê Cotmehê roja Pêncşemê saet 24:00an bidome.

Hatibû plankirin ku îro li Mêrdînê ji bo protestokirina operasyonên Tirkiyeyê yên li ser sînor meşek were lidarxistin.

Walitiyê çalakiyên ku derveyî qedexeyan dimîne wisa rêz kirin: "bernameyên ku ji aliyê sazî û dezgehên giştî ve tên organîzekirin, cejnên fermî, rojên bibîranînê yên fermî, merasîm û şahiyên fermî û bernameyên ku ji aliyê van saziyan ve li gorî kevneşopî û adetan tên li darxistin."

Di beşa hincetan a daxuyaniyê de hat îdiakirin ku daxuyaniyên çapemeniyê vediguherin "çalakiyên derqanûnî".

Çalakiyên qedexe wiha ne:

Her cure civînên vekirî û meşên xwepêşandanê, merasîmên pêşwazîkirin û xatirxwestinê yên girseyî, daxuyaniyên çapemeniyê yên sazî û rêxistinên li derveyî avahiyên xwe pêk tînin, çalakiyên rûniştinê, mîtîng, sazkirina konan, kampanyayên îmzeyan, vekirina standan, merasîmên cenazeyan ên girseyî û serdanên goristanan, merasîma bîranînê, festîval, konser, şahî, şano, pêşandan, her cure çalakiyên dengî û dîtbarî, firandina bafirok, fanosên mirazî, drone-paramotoran, çalakiyên hewavaniyê, ji bilî çalakiyên bazirganî yên kes û saziyên bi nasnameya bazirganî; belavkirina belavok, broşuran, daliqandina afîş û pankartan.

*Mardin Valiliği: http://www.mardin.gov.tr/13102023-yasaklama-karari*

*Cumhuriyet - https://www.cumhuriyet.com.tr/turkiye/mardin-valiligi-duyurdu-kentte-7-gunluk-eylem-yasagi-karari-2129687*

### Qedexeya Oktoberfestê ya Walîtiya Eskîşehîrê: Sedem, Nîzam û Ewlehiya Giştî ye

Walîtiya Eskîşehîrê Festîvala Cotmehê ya ku wê di navbera 14-15ê Cotmehê de li Parka Botanîkê bê lidarxistin, qedexe kir.

Walîtiya Edeneyê duh (12ê Cotmehê) Festîvala Rockê ya Çukurovayê qedexe kiribû, lê piştî ku fîrmeya organîzasyonê serî li rêyên hiqûqî da, danê êvarê bi biryara Dadgeha Îdarî ya Edeneyê biryara qedexeyê hat betalkirin.

Festîvala Anadoluyê ya ku dihat plankirin di heyama Walî Erol Ayyildiz de di dawiya meha Gulana 2022yan de li Eskîşehîrê bê lidarxistin, ji ber hincetên bi heman rengî hatibû betalkirin.

Ev qedexe destpêka qedexeyên festîvalê bû ku di havîna 2022an de dest pê kir û di sala 2023an de berdewam kir. Di dema Waliyê Eskîşehîrê yê nû Huseyîn Aksoy de destûr ji bo festîvalê nehat dayîn.

Piştî daxuyanî hat dayîn ku dê festîval bê lidarxistin, di 10ê Cotmehê de serokên şaxên Egîtîm Bîr-Sen û Sendîkaya Nûjeniyê bi daxuyaniyeke hevpar bang li walî kir ku "ji bo betalkirina mîhrîcanê peywira xwe bi cih bîne".

Walîtiyê hincetên biryara qedexekirinê wiha rêz kir:

“Ji bo welatiyên me maf û azadiyên xwe yên bingehîn ku bi peymanên navneteweyî yên li ser maf û azadiyan û bi Makezagon û zagonên Komara Tirkiyeyê piştrast dibin bi kar bînin, ji bo dabînkirina aramî, nîzama giştî û ewlehiya giştî li bajarê me, pêşîlibergirtina tawanan, parastina maf û azadiyên bingehîn, maf û azadiyên kesên din û nîzama giştî. ..."

*Eskişehir Valiliği - http://www.eskisehir.gov.tr/yasaklama-karari23*

*Sanat Özgürlüğünü İzleme Platformu - https://www.reportare.com/soz/haber/eskisehir-valiliginden-octoberfest-yasagi/*

### Di operasyona polîsan a bi ser cemevî de derî hatin şikandin û gelek kes hatin binçavkirin.

Polîsan serê sibehê saet di 06.00an de girt ser Komeleya Çandê ya Pîr Sûltan Abdalê (PSAKD) Şaxa Sariyerê / Mala Cemê ya Zeynep Yildirimê ya li Taxa Sariyer Armutlu ya Stenbolê.  Deriyên komeleyê şikandin. Rêveberê Mala Cemê Dursun Çiçek jî di nav de gelek kes hatin binçavkirin. Çiçek piştre hat berdan.

Hat ragihandin ku polîsan li Mala Cemê dest danîne ser hin belgeyan.

*Pirha - https://pirha.org/psakd-zeynep-yildirim-cemevine-polis-operasyonu-kapilari-kirdilar-gozaltilar-var-398017.html/13/10/2023/*

*Muhalif - https://www.muhalif.com.tr/haber/pir-sultan-abdal-kultur-dernegine-polis-baskini-gozaltilar-var-175875*

**14ê Cotmehê, 2023**

**Li Hatayê polîs û tevgera taybet girt ser sitargeha mexdûrên erdhejê, 5 kes bi kelepçeya ters hatin binçavkirin.**

Li taxên Defne û Samandagê danê sibehê polîsan girtin ser konteyniran.

Li Taxa Çekmeceyê ya Navçeya Defneyê ya Hatayê serê sibehê saet di 06.00an de polîs û tevgera taybet girt ser qada ku ji konteynir û konên erdhejzedeyan vedane pêk tê. Di serdegirtinê de 5 kes hatin binçavkirin. Mexdûrên erdhejê yên ku li herêmê man, diyar kirin ku deriyên konteyniran hatin şikenandin. Di nava kesên hatin binçavkirin de Endamê Lijneya Rêveberiya Komeleya Mafên Mirovan (IHD) a Şaxa Hatayê Salman Altinoz jî heye.

Di serdegirtinan de tiştên di konteyniran de hatin belavkirin û deriyên konteyniran hatin xerakirin.

Rêveberê AFAD'ê der barê mijarê de ji nûçegihana Gazete Duvarê Burcu Ozkaya Gunaydin re daxuyanî da û got, "Dewletê ev qad malhemûkir.  Mirovên li vir bê ewlehî û bê parastin dijîn. “Dewlet dê li vir cihê kar ava bike.

Dayika Ahmet Atakan ê di berxwedana Geziyê de jiyana xwe ji dest da Emsal Atakan jî wiha got: "Mirovan di serê sibê de polis dîtin li ser serê xwe. Ne agahî dan xwediyê malê, ne jî agahdar kirin, ne jî bang li me kirin. Çend kes hene li vir xwedî milk in û para me jî hene. Haya kesî jê tune ye. Ev der bi eşkereyî çopandin"

Li navçeya Samandagê jî polîsan bi ser Şaxa Egîtîm Senê ya Samandagê û hin konteyniran de girt û hin kes binçav kirin.

*Gazete Duvar - https://www.gazeteduvar.com.tr/hatayda-konteynerlere-polis-baskini-ihd-yoneticisi-de-gozaltina-alindi-haber-1642272*

*Evrensel - https://www.evrensel.net/haber/501154/hatayda-konteynerlere-polis-baskini*

*Yeni Yaşam - https://yeniyasamgazetesi5.com/hatayda-konteynerlere-baskin-cok-sayida-kisiye-gozalti/*

**Polîsan di hefteya 967an de çalakiya rûniştinê ya Dayikên Şemiyê ya li Qada Galatasarayê bi binçavkirinan asteng kir.**

Tevî ku biryara binpêkirina mafan a Dadgeha Makezagonî (AYM) ji Qeymeqamiya Beyoglûyê re hat ragihandin jî, Dayikên Şemiyê di hefteya 967an de ji aliyê polîsan ve hatin astengkirin ku biçin Qada Galatasarayê.

Dadgeha Makezagonî di du dozên cuda yên ku piştî serlêdanên sûc ên Dayika Şemiyê Masîde Ocak û parêzvana mafên mirovan Sebla Arcan pêk hatin de biryara binpêkirina mafan da.

Tevî van her du biryarên Dadgeha Makezagonî parêzvanên mafan li Galatasarayê bi tundiya polîsan tên astengkirin ku daxuyaniya çapemeniyê bidin. 24 Dayikên Şemiyê û parazvanên mafan di çalakiya 14ê Cotmehê de hatin binçavkirin.

Kesên hatin binçavkirin (Eren Keskin, Leman Yurtsever, Hanife Yıldız, Maside Ocak, Besna Tosun, Ali Newroz Tosun, Hasan Karakoç, Mikail Kırbayır, Ali Ocak, Oya Ersoy, Gülseren Yoleri, Hunkar Yurtsever, Doğan Ozkan, Ayşegul Devecioğlu, İsmail Yucel, Aydın Aydogan, Hatice Onaran, Gulendam Ozdemir, Salim Derelioglu,

Cüneyt Yılmaz, Nazım Dikbaş, Mustafa Emin Buyukcoşkun, Sevim Sancaktar û Sevilay Aydemir) di danê êvarî de hatin berdan.

*Cumartesi Anneleri (Twitter) - https://x.com/CmrtesiAnneleri/status/1713208174348546277?s=20*

*Sol Haber - https://haber.sol.org.tr/haber/cumartesi-anneleri-aym-kararlarina-ragmen-27nci-kez-gozaltina-alindi-385536*

*Evrensel - https://www.evrensel.net/haber/501207/cumartesi-anneleri-eyleminde-gozaltina-alinanlar-serbest*

**Walîtiya Diyarbekirê konserên Festîvala Rêya Çandê ya Sûrê betal kir**

Hemû konser û pêşandanên 2yemîn Festîvala Rêya Çandê ya Sûrê ku dê di navbera 14-22ê Cotmeha 2023yan de bi hevkariya Wezareta Çand û Turîzmê ya Tirkiyeyê û Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê bihata lidarxistin, hatin betalkirin.

Di daxuyaniya ku li ser hesabê fermî yê Walîtiya Amedê ya Twîtterê hat dayîn de wiha hat gotin: “Hemû konser û pêşandanên ku di çarçoveya Mîhrîcana Rêya Çandê ya Sûrê de hatibûn plankirin hatin betalkirin. "Em vê agahiyê pêşkêşî hemû gelê xwe dikin."

Hate ragihandin ku dê di mîhrîcanê de ji bilî konser û pêşandanan bernameyên din berdewam bikin.

Kesên ku ji bo konsera Simge Sagin qad tije kirin, beriya konserê bi qasekê hîn bûn ku konser hatiye betalkirin. Di festîvalê de ji bo Oguzhan Koç, Alişan, Merve Ozbey, Fatma Turgut, Murat Dalkılıç, Derya Uluğ, Ferhat Goçer û Bengû jî konserek hatibû plankirin. Asli Hunel û Ugur Aslan jî li Navenda Kongre û Çandê ya Sezaî Karakoç dê derketina ser dikê.

Li Diyarbekirê hin saziyên sivîl û partiyên siyasî ji ber êrîş û pevçûnên di navbera Îsraîl û Hamasê de ku di 7ê Cotmehê de dest pê kirin û heta niha bi hezaran kes tê de jiyana xwe ji dest da daxwaza betalkirina festîvalê kiribûn.

*Diyarbakır Valiliği (Twitter) - https://x.com/dbakirvalilik/status/1713214361596993987?s=20*

*Tigris Haber - https://www.tigrishaber.com/son-dakika-sur-kultur-yolu-festivali-iptal-edildi-93644h.htm*

**Tebinî ji dozên ku tên şopandin:**

**Doza Sibel Tekin (3ê Cotmehê, 2023, Sêşem)**

Sîbel Tekin dema ku belgêfîlma bi navê “Jiyana di tariyê de dest pê kir” dikişand bi hinceta ku "endama rêxistina terorê ye" û "bi talîmata rêxistina terorê keşf kiriye" di 16ê Kanûna 2022an de hat binçavkirin û di 17ê Kanûnê de bi tawanbarkirina “endamtiya rêxistinê” hat girtin. Doza wê li Dadgeha Cezayê Giran a 26emîn a Enqereyê dest pê kir. Tekîn di 30ê Çileya 2023an de bi qedexeya derketina derve û tedbîrên kontrola edlî hat berdan.

Di danişîna ewil a di 23ê Sibata 2023an de pêk hat de şerta kontrola edlî ya Tekîn hat betalkirin. Di danişîna duyemîn a di 8ê Hezîrana 2023an de qedexeya derketina derve hat rakirin û biryar hat dayîn ku dîmenên ku Tekîn ji bo belgefîlmê kişandiye ji aliyê pisporan ve bê lêkolînkirin.

Di rûniştina sêyemîn a 3ê Cotmeha 2023an de parêzerên Sîbel Tekin diyar kirin ku muwekîla wan sûc nekiriye û beraata wê xwestin. Dozger beriya ku der barê esasê de nêrîna xwe vebêje, biryar da ku li li benda encamên lêkolîna materyalên dijital bin.  Rûniştina din a dozê dê di 5ê Kanûna 2023an de pêk were.

**Doza Xwendekarên Zanîngeha Boğaziçiyê ya #JiNihaPêVeLiMeYe (11ê Cotmehê, 2023, Çarşem,)**

Xwendekarên Zanîngeha Bogazîçiyê di 1ê Sibata 2021î de bi dirûşma #JiNihaPêVeLiMeYe banga kombûnê kiribûn. Bangewazî ji bo piştevaniya 2 hevalên wan bû ku ji ber tayînkirina rektorê zanîngehê ya bi biryarnameya Serokomariyê protesto kiribûn, hatibûn girtin. Li dû bangewaziyê, li 52 xwendekaran doz hat hatibû vekirin. Di rûniştina dozê ya di 11ê Cotmeha 2023an de li 49emîn Dadgeha Cezayê Asliyeyê ya Stenbolê pêk hat de biryar hat dayîn ku hemû xwendekar cihê cihê bên beraetkirin. Doza xwendekarê ku di dema darizandinê de jiyana xwe ji dest da, hat xistin.

Der barê xwendekarên ku li derdora Etîler û Bebekê hatin binçavkirin û piştre hatin berdan, bi hinceta qanûna Civîn û Xwepêşandanê binpê kirine, doz hatibû vekirin.

**Doza Omer Işık û Yên Din (12ê Cotmehê, 2023, Pêncşem)**

Ji ber ku di çarçoveya pêvajoya çareseriyê de ku di salên 2013-2015an de ji aliyê hikûmetê ve hat îlankirin û meşandin de, wekî çavdêr çalakî meşandin, der barê 9 endam û rêveberên saziyên sivîl de ku serokê berê yê Şaxa ÎHDyê ya Wanê Omer Işik jî di nav de ye, bi hinceta "endamtiya rêxistina terorê" doz hatibû vekirin. Di 7emîn danişîna dozê ku li 2yemîn Dadgeha Cezayê Giran a Wanê di 12ê Cotmeha 2023an de pêk hat de 2 kes bi 7 sal û 6 meh cezayê girtîgehê hatin cezakirin, Omer Işik jî di nav de li yên mayî jî 6 sal û 3 meh cezayê girtîgehê hat birîn.